Li ser aşîya parastina li dijî Hepatît B-yê

Hepatît B, enflamasyona gurçîkê ye ku enfeksîyona vîrûsa Hepatît B-yê (HBV) dibe sebebê wê. Ev vîrûs, bi xwîynê an jî bi rêya avîyên kesekî bi vîrûs derbas dibe (wek nimûne didema têkilîya cinsî de). Li welatên endustrîya xwe avakirî, ji ber ku xwîyn û amadeyîyên xwîynê bi pirranî ji alîyê patogenan ve tên nirxandin, têkilîyên nêzîk di derbasbûna wê de sebebekî giring e, ji ber vî awayî wek ewle tê qebûlkirin. Ji ber vî sebebî, xeter, di destpêka gihîştinê de bêtir dibe. Patogen, kare di heman zemanî de ji jineka ducanî ya bi awayekî kronîk bi vîrûsa Hepatîtê be, derbasî zarokî bibe. Ji ber vî awayî hemû ducanî divên werin nirxandin. Eger encama nirxandinê/testê de erênî be, zarokî nûbûyî piştî bûyînê di heman zemanî de dê profîlaksîsîya diberxwedêrîyê wergire. Hepatît B; bi xuyanîyên wek grîbê an gazinên gostroîntestînal, westîyayîbûyîn û kelîna laşî dest pê dike. Paşê, dibe ku rengê destava piçûk bi rengê qehweyê ve biguhere, destava mezin rengê xwe ji dest bide û çerm zer bibe û koncunktîvaya çavî xuya bibe (zerbûn). Hema hema yek ji sed nexweşên bi vê nexweşînê mirine û nexweşîn, hema hema bi ji sedî dehê mezinên derbasî wan bûyî re bûye kronîk (ev jimar di zarokan de %90 e); lêbelê vîrûs bi her awayî di laşî de dimîne. Vîrûsu Hepatît B-yê di heman demê de bêyî ku hîç nîşanên nexweşînê tune bin jî kare rê li ber enfeksîyonên kronîk veke. Mirovên bi awayê kronîk enfektebûyî ji der û dora xwe jêdera enfeksîyonê ne. Li Elmanyayê ji sedî 0.3 heta 0.8ê nifûsê bi awayekî kronîk nexweşîna HBVê bi xwe re digerîne; li welatên din ên wek Efrîqa û Asyayê firkîya dîtina kesên enfekte hê jî bêtir e. Eger nexweşîn bibe kronîk, dibe ku sîroza û/an kîrsînomaya hucreya kezeba reş bibe encameka demdirêj. Ji bo Hepatît B-ya akût dermankirineka xuyayî tune ye. Parastina yekane, aşîya di dema xwe de kirî ye.

Aşî

Di aşîyên li dijî Hepatît B-yê de, rûyê bihevvekirîyên vîrûsa Hepatît B-yê yê bi bikaranîna hucreyên bi rêbaza teknologîya genê bidestxistî û paşê bi rêbazên nûjen safîkirî hene. Eger ev rast bên bikaranîn, ev li dijî nexweşîna Hepatît B-yê diberxwedêrîyeka demdirêj dabîn dibin. Aşîya Hepatît B-yê sê car tê pêkanîn. Dixtorê aşîyê dike kare li ser dema navbera van aşîyan, destpêk û bidawîhatina parastina aşîyê û eger bivê li ser aşîyên ji bo xurtkirinê divên zanyarîyê bide we. Aşîya Hepatît B-yê tevlî aşîyên din di heman zemanî de karin werin pêkanîn. Aşî (bi nava masûlkeyê ve an jî eger bivê wek lêxistina li binê çermî) tê lêxistin. Li milê jorîn an jî ji yek alîyekî ve çoka jorîn tê xistin. Di kesên xetera derbasbûna nexweşînê bilind; wek nimûne karkerên sihhetê de biserketina aşîyê piştî aşîkirina hîmî tê nirxandin û eger gerek be aşî dîsa tê kirin. Salixê kontrolkirina biserketina aşîyê di heman zemanî de di nexweşên sîstema wan a diberxwedêrîyê kuştî de (wek nimûne bi sebebê dermankirina şêrpenceyê/kansêrê) jî tê dayîn.
Tevlî aşîya yekanî ya li dijî Hepatît B-yê ya li vê derê behsa wê kirî, di heman zemanî de aşîyên tevlîhev ên li dijî nexweşînên din parêzer (wek nimûne aşîya şeşqatî) kare ji bo aşîkirana bebekan û zarokên piçûk bi kar were. Tevlî van aşîyan, ji bo aşîyên tevlîhev jî belgeyên cuda yên zanyarîpêdanê hene.

Kî divên werin aşîkirin?

1. Teqwîma aşîkirinê ji heşt hefteyan dest pê dike û ji bo hemû zarokên keç û kurr li dijî Hepatît B-yê salixê aşîyê tê dayîn. Ji bo vê mebestê aşîyên tevlîhev ên berê behsa wan hat kirin jî guncaw in. Ji bebekekî sîstema diberxwedêrîyê pê nehatiye dayîn re ev her gav kare were kirin û di heman zemanî de salixê wê tê dayîn.

2. Nûbûyîyên dêya wan bi Hepatît B-yê ketî piştî bûyînê divê di wê gavê de werin aşîkirin û dermankirina îmmunoglobûlînê were dayîn (giring e: pêdana sîstema diberxwedêrîya hîmî ji bîr nekin).
3. An jî Ji ber têrnekirina sîstema diberxwedêrîyê ya li hêvîyê bûyî ya heyî ya kesên bi nexweşîna Hepatît B-yê ketî an jî nexweşîneka heyî, wek HIV û/an kesên nexweşîna wan a Hepatît C-yê heyî, kesên nexweşîna gurçikê bi wan re heyî, nexweşên dîyalîzê û yên din.
4. Kesên li derveyê cîhê kar di koma xetera bilind de ne, wek nimûne di malbatê de û civata jîyînê de têkilîkirina bi kesên bi Hepatît B-yê ketî re, bi kesên bi wan re xetera bilind a enfeksîyonê heyî re têkilî û tevgera cinsî û bikaranîna heman enjektora bi bikarhênerên dermanên rehên xwînê, girtîyên zîndanan û nexweşên muhtemel ên dezgehên psîkîyatrîk.
5. Kesên li cîhê karî xetera wan a pirr heye, wek nimûne; karkerên tibbê û dirançêkerîyê (tevlî karkerên laboratûvarê, personelê paqijîyê û stajyeran), kesên di ekîba mudaxaleya pêşîn de, karkerên polêsîyê û kesên di dezgehên bi xetera pirr de kar dikin, wek nimûne; zîndan, malên hevkarîya bi kesên penahber re, dezgehên ji bo kesên astengdar/kêmendam.
6. Ji bo yên gelekê caran bi nexweşîna Hepatît B-yê dikevin û rêwîyên diçin gerra cîhên îklîmên wan tropîkal an sabtropîkal in divê nirxandina kesî ya xeterê were kirin.

Kî divên neyên aşîkirin?

Kesê nexweşîna wî ya akût a bi kelekel (bêtirî 38.5°C-yî) a jê re dermankirin divê divê aşî nebe. Dema ku nîşanên nexweşînê kêm bûn aşî kare were kirin. Di seransera ducanîbûnê de, aşî, bi tenê eger ku xetereka akût a enfeksîyonê hebe divê were kirin. Eger ku li dijî yek ji tevlîhevîya li dijî aşîyê hesasîyeteka pirr hebe an jî piştî aşîyeka li dijî Hepatît B-yê kirî nîşanên nexweşînê peyda bibin dê dixtorê we yê aşîyê ji bo axaftina li ser gerekbûna vê aşîyê û gerekbûna dewamkirina wê hevdîtinekê bide xuyandin.

Tevgerên piştî aşîyê

Pêdivêya kesên aşîkirî bi bêhnvedaneka taybet tune ye; lê divên di seransera sê sorjên piştî aşîyê kêmkirinên fizîkî yên neasa dûr bikevin. Kesên li dijî reaksîyonên gera xwînê meyla wan heyî an jî hesasîyeta wan a pêzan heyî divên berêya aşîkirinê bi dixtorê xwe re li ser vê mijarê bidin û bistînin û bi dixtorî bidin zanîn.

Raperkên gengaz/muhtemel ên herêmî û tevahî yên piştî aşîyê

Piştî aşîyê tevlî diberxwedêrîya xwastî û tevlî ji ber vî sebebî parastina ji nexweşînê, bi ji %10ê kesên aşîkirî re li devera aşîkirî sorbûn û werimîna biêş kare were dîtin. Ev, îfadeyeka asa ya nîşana diberxwedana laşî ya bi aşîyê re ye û xwe di nava yek û sê rojan de nîşan dide û kêm caran dirêjtir jî dimîne. Kêm caran girêkên lenfê yên li dorê dibin biwerimin. Nîşanên tevahî yên wek bêtirbûna germahîya di asta kêm û navîn de, lerizîn, êşa serî, êşa endaman (êşên masûlkeyan an movikan) an westîyayîbûnê kêmdîtî ne. Tevlî vî awayî, xerabûnên gastroîntestînal (lihevketina dilî, vereşîn û ‘emel) dibin werin dîtin. Piştî aşîyê di astên enzîmên cegera reş de bêtirbûnek kêm caran tê dîtin. Raperkên binavkirî pirrê caran demkî ne û bi awayekî bi lez û bêyî encamdayînê kêm dibin.

Gelo ji ber aşîbûyînê hîç komplîkasyon tên dîtin?
Komplîkasyonên aşîyê encamên aşîyê yên gelek kêmdîtî ne ku li ser rewşa sihheta kesê aşîkirî bandoreka giring nîşan dide û ji pêşgirtina asa wirdatir e. Kare wek di rewşên kesî de komplîkasyonên sîstema bazûyî (wek nimûne di rewşa kêmgirtina bazûyî, felca demkî) û di jimara trombosîtan de kêmbûneka xuyayî were binavkirin; divê lê were kolan ka hîç têkilîya vê rewşê bi aşîyê heye an tune ye.

Li ser mijara bandorên muhtemel ên kêlekî şêwra bi dixtorî re
Tevlî vê belgeya danzanînê, dixtorê we ji bo we xizmeta şêwrê dike. Ji derveyê reaksîyonên deverî û tevahî yên li jorê hatin xuyandin ên zû rû didin eger çi nîşan rû bidin, dixtorê we yê aşîyê dikin jixwe dê mû'ayeneya we bike.
Hûn karin bi vî awayî xwe bigihînin dixtorê xwe yê aşîyê:

Qebûlnekirina Berpirsîyarîyê
Belgeya danzanînê ya orîjînal (versîyon: 10/2014) li ser navê Enstîtûya Robert-Koch-Institut bi destûra Deutsches Grünes Kreuz e.V.-yê hatiye wergerandin. Metna bi Elmanî ya girêder e û di rewşa her çi şaşîya wergerandinê an jî ji nû ve nivîsîna wergêrana heyî an jî wergerandina wê de ji bo rewşa heyî dê hîç berpirsîyarîyek neyê qebûlkirin.

Nav_____
Name

Aşîya parêzer a li dijî Hepatît B-yê
Schutzimpfung gegen Hepatitis B

Hûn karin serfirazîya forma danzanîna aşîya parêzer a li dijî Hepatît B-yê di vê metnê de bibînin. Di vê metnê de zanyarîyên nexweşîneka bi aşîyê rê li berê were girtin, li ser aşîyê, li ser raperkên aşîyê û komplîkasyonên muhtemel ên bi aşîyê ve girêdayî hene.
Anliegend erhalten Sie ein Merkblatt über die Durchführung der Schutzimpfung gegen Hepatitis B. Darin sind die wesentlichen Angaben über die durch die Impfung vermeidbare Krankheit, den Impfstoff, die Impfung sowie über Impfreaktionen und mögliche Impfkomplikationen enthalten.

Berêya hûn aşîyê bikin we divê hûn zanyarîyên jêrê bidin:
Vor der Durchführung der Impfung wird zusätzlich um folgende Angaben gebeten:

1. Kesê vê aşîyê dike niha li ser xwe ye?
   Ist der Impfling gegenwärtig gesund?

   ☐ erê *(ja)* ☐ na *(nein)*

2. Tu hesasîyeteka/alerjîyeka tê zanîn ê kesî aşîbûyî heye?
   Ist bei dem Impfling eine Allergie bekannt?

   ☐ erê *(ja)* ☐ na *(nein)*

   Eger hebe, kîjan _____
   wenn ja, welche

3. Bi kesê aşîbûyî re piştî aşîya berî vê hîç raperkên hesasîyetê/alerjîyê, kelekela zêde an jî raperkên ne asa peyda bûn?
   Traten bei dem Impfling nach einer früheren Impfung allergische Erscheinungen, hohes Fieber oder andere ungewöhnliche Reaktionen auf?

   ☐ erê *(ja)* ☐ na *(nein)*

Eger hûn bixwazin li ser aşîya parastina ji Hepatit B-yê zanyarîya bêtir bi dest bixin ji dixtorê xwe yê aşîkirinê pêzanînê bixwazin!
Falls Sie noch mehr über die Schutzimpfung gegen Hepatitis B wissen wollen, fragen Sie den Impfarzt!

Ji kerema xwe di hevdîtina aşîyê ya piştî vê de anîna kerdê xwe yê aşîyê ji bîr nekin!
Zum Impftermin bringen Sie bitte das Impfbuch mit!

Beyana li ser
Einverständniserklärung

Qebûlkirina aşîya rêlibergir a li dijî Hepatît B-yê
zur Durchführung der Schutzimpfung gegen Hepatitis B

Navê kesê aşîbûyî _____
Name des Impflings

Tarîxa Xwedêdanê _____
geb. am

Min têdeyîyên vê belgeya danzanînê fehm kir û min di hevdîtineka bi dixtorê xwe re pêzanîna bi kitkite wergirt.
Ich habe den Inhalt des Merkblatts zur Kenntnis genommen und bin von meinem Arzt/meiner Ärztin im Gespräch ausführlich über die Impfung aufgeklärt worden.

□ Hîç pirseke min î din tune ye.
Ich habe keine weiteren Fragen.

□ Ez aşîya ku li dijî Hepatît B-yê salixê wê tê dayîn qebûl dikim.
Ich willige in die vorgeschlagene Impfung gegen Hepatitis B ein.

□ Ez aşîyê qebûl nakim. Li ser nebaşîyên tevahî yên kêmbûyî yên aşîyê ez hatim zanakirin.
Ich lehne die Impfung ab. Über mögliche Nachteile der Ablehnung dieser Impfung wurde ich informiert.

Şîrove_____
Vermerke

Cîh û tarîx _____
Ort, Datum

Îmzeya kesê aşîbûyî, an jî îmzeya welîyê wî
Unterschrift des Impflings bzw. des Sorgeberechtigten

Îmzeya dixtorî
Unterschrift des Arztes/der Ärztin